بسم الله الرحمن الرحيم

SİYER
YAYINLARI

Weşanên Siyerê: **09**
Rêza Siyerê: **04**
Rêza Kurdî: **01**

Navê Berhemê
**MÎNA SEHABIYAN JI PÊXEMBERÊ ME (S) HEZKIRIN**

Nivîskar
**Muhammed Emîn YILDIRIM**
**m.emin@siyerarastirmalari.org**

Werger
**Murad Pola**

Serastkirin
**Murad Celalî**

Xwedina Dawîn
**Heyderê Silhedîn**

Mîzanpaj & Berg
**Mücahit Ak**

Çap & Cild
**Aktif Matbaa ve Reklam Hiz. San. Tic. Ltd. Şti.**
Söğütlü Çeşme Mh. Halkalı Cd. No: 245/1 Sefaköy-İstanbul
Tel: 0212 698 93 54
Sertifika No: **13978**

Çapa Yekem: **Hezîran 2016**

ISBN: **978-605-9283-50-2**

SİYER YAYINLARI
Bağlar Mh. Çeşme Cd. No: 10/A Güneşli Bağcılar/İstanbul
Tel & Fax: (0212) 544 76 96 – (0212) 544 58 46 Gsm: (0554) 930 07 04
www.siyeryayinlari.com | satıs@siyeryayinlari.com

# MÎNA SEHABIYAN JI PÊXEMBERÊ ME
## (sallallahu eleyhî we sellem)
# HEZKIRIN

MUHAMMED EMÎN YILDIRIM

SİYER
YAYINLARI

## Muhammed Emîn Yildirim

Di sala 1973 yan de li Erzirom-Xoresanê jidayik bû. Piştî ku dibistana seretayî qedand, di salên perwerdeya navîn û lîseyê de ji ligel perwerdeya fermî li medreseyê dersa erebî û ilmên Îslamî yên sereke xwend. Paşê di sala 1989an de hat Stenbolê û li wir perwerdeya xwe ya di warê ilmên Îslamî de domand. Di navbera salên 1999 û 2004an de li Misrê xebatên xwe yên li ser erebî û ilmên Îslamî kir.

Ji sala 1995an pê ve dest pê kir birêkûpêk dersên heftane dan. Peyra ev dersên xwe di bin banê Weqfa Hikmetê û Komeleya Hikmetê de domand.

Di xebatên avakirina Navenda Lêkolînên Siyerê ya ku di sala 2010an meha cotmehê de li Stenbolê semtê Eyûbê di Qonaxa Zekaî Dede de dest bi fealiyetên xwe kiriye pêşengî kir. Her hefte rojên şemiyê li navenda navborî bi sernavê "Siyer û Sehabe" dersên ji gel re vekirî dide. Ev dersana hemû her wiha li ser navnîşana înternetê www.siyertv.comê jî tên weşandin.

Muhammed Emîn Yildirimê zewicî û bavê sê zarokan xebatên xwe yên di warê lêkolîn û perwerdeyê de berdewam dike.

Berhemên Wî Yên Hatine Weşandin

- İbadetin Beyni Dua (2002)
- İnsanî İlişkilerde İlahî Ölçu (2004)
- Vahyi Hayata Taşımak (2005)
- Alemlere Rahmet Hz. Muhammed (sas) (2006)
- Sahabeyi Nasıl Anlamalıyız? (2007)
- Dâru'l-Erkam, Vahyin Nuzul Surecinde Şahsiyet Egitimi (2008)
- Hz. Peygamber'in (sas) Albumu (2010)
- Siyer Atlası (Tahkik ve Notlandırma) (2010)
- Efendimiz'i Sahabe Gibi Sevmek (2011)
- Risalet Davasının Annesi Hz. Hatice (2011)
- Efendimiz'in (sas) Havarisi ve İhlâs Abidesi Zubeyr b. Avvam (2011)
- İnsanlıgın Kurtuluşu Hac, Ömrun Bereketi Umre (2011)
- Yaşayan Şehit/Şehidu'l-Hayy Talha b. Ubeydullah (2012)
- Ummetin Emini Ebû Ubeyde b. Cerrâh (2012)
- Arslan Pençesi, Hamaset Kahramanı/Sa'd b. Ebî Vakkas (2013)
- Asr-ı Saâdet'te Ticaret ve Tuccar Sahâbîler (2014)

*Ji bo wanê dikarin hez bikin…*

# Naverok

**Serê Gotinê ........................................................................ 11**

**Destpêk........................................................................................ 17**

BEŞA PÊŞÎN

**Divê Em Çima û Çawa Pêxemberê Me (sallallahu eleyhî we sellem) Hez Bikin?**

**Divê Em Çima Pêxemberê Me (s) Hez Bikin? ............................... 27**

- Ji Pêxemberê Me (s) hezkirin, ne mijara hissiyat û kelecanê ye, lê pêwîstiyeke îmanê ye. .....................................27
- Ji Pêxemberê Me (s) hezkirin, wesîleya herî girîng e ku mirov tem û lezeta îmanê hilde......................................28
- Ji Pêxemberê Me (s) hezkirin, sedema herî bingehîn ya ji Xwedê (c) hezkirin û qezenckirina mexfîret û rehmeta wî ye. .............31
- Ji Pêxemberê Me (s) hezkirin, tekane tişt e ku Nebiyê Pîrozê ku di 23 salên jiyana xwe ya rîsaletê de şev û roja xwe ji bo umeta xwe feda kiriye, ji me xwestiye................32
- Ji Pêxemberê Me (s) hezkirin, li hember Pêxemberê Rehmetê yê ku em ji xwe re kirine bira deynekî wefayê ye...................34

- Ji Pêxemberê Me (s) hezkirin, ji bo em di meneya heqîqî de ji Rebbê me yê ku ew wekî nîmetekî bexişandiye me re şikra xwe eda bikin pêwîstiyek e. ....... 37

**Divê Em Çawa Pêxemberê Me (s) Hez Bikin? ....... 41**

- Ji Pêxemberê Me (s) hezkirin, bi vê mimkun e ku em tu tiştî bi qasî wî hez nekin. ....... 42
- Ji Pêxemberê Me (s) hezkirin, tenê di hemû dem û qadên jiyanê de wekî rêberekî bênîqaş qebûlkirina wî mimkun dibe. ....... 43
- Ji Pêxemberê Me (s) hezkirin, bi teslîmiyeteke jidilûcan qebûlkirina hukmên wî mimkun e. ....... 44
- Ji Pêxemberê Me (s) hezkirin, ne tenê bi aqil; him bi aqil him jî bi qelb lê bi taybetî jî qelb mimkun e. ....... 45
- Ji Pêxemberê Me (s) hezkirin, her bi wê mimkun e ku meriv gava xwe neavêje pêşiya gava wî, dengê xwe li ser dengê wî nexe. ....... 46
- Ji Pêxemberê Me (s) hezkirin, ne tenê ew e ku meriv wî bike wekî xatireyeke şirîn, lê ya rastî gava meriv bi wî re peywendiyeke zindî datîne, a wê hingê ev yeka mimkun dibe. ....... 48
- Ji Pêxemberê Me (s) hezkirin, bi her tiştî belê bi hemû tiştî razîkirin û kêfxweşkirina wî mimkun e. ....... 49


BEŞA DUDUYAN

## Mîna Sehabiyan Pêxemberê Me (sallallahu eleyhî we sellem) Hezkirin


**Mîna Sehabiyan Ji Pêxemberê Me (s) Hezkirin ....... 55**

- Evîna Pêxember ya Abîdeya Sidq/Rastiyê ....... 58
- Hezkirina Pêxember ya Faruqê Îslamê ....... 67
- Hezkirina Pêxember ya Yûsufê Umetê ....... 75
- Hezkirina Pêxember ya Hz. Eliyê Kekê Rîsaletê ....... 79
- Hezkirina Pêxember ya Hz. Xedîceya Dayika Rîsaletê ....... 86
- Evîndarekî Pêxember: Hubeyb bîn Ediyy ....... 88

- Ji Pêxemberê Me (s) hezkirina Sewbanê ku kinca baweriyê li xwe kiribû....100
- Wekî Sumeyrayê ji Pêxemberê Me (s) hezkirin....103
- Wekî Nesîbeyê ji Pêxemberê Me (s) hezkirin....111

BEŞA SISYAN

## Pêxemberê Me (sallallahu eleyhî we sellem) Çawa Ji Sehabiyan Hez Kir?

**Pêxemberê Me (s) Çawa Ji Sehabiyan Hez Kir?.... 125**
- Hezkirina Pêxemberê Me (s) ya ji bo Hz. Ebû Bekir....134
- Hezkirina Pêxemberê Me (s) ya ji bo Hz. Omer....135
- Hezkirina Pêxemberê Me (s) ya ji bo Hz. Osman....136
- Hezkirina Pêxemberê Me (s) ya ji bo Hz. Elî....137
- Hezkirina Pêxemberê Me (s) ya ji bo Hz. Xedîceyê....139
- Hezkirina Pêxemberê Me (s) ya ji bo Hz. Eîşeyê....140
- Di Hezkirinê De Îtidal/Aheng û Edalet....141
- Di Hezkirinê de Nîsbet û Derece....149

BEŞA ÇARAN

## Pêxemberê Me (sallallahu eleyhî we sellem) Ji Umeta Xwe Çawa Hez Kir?

**Pêxemberê Me (s) Ji Umeta Xwe Çawa Hez Kir?.... 159**
- Lavayên Pêxemberê Me (s) Yên Danê Îbadetên Şevê....162
- Xecê Xatirxwestinê Ya Pêxemberê Me (s) û Lavayên Wî Yên Li Hecê....169
- Li Ser Navê Umetê Qurbandayîna Pêxemberê Me....171
- Çaxê Pêxemberê Me (s) Xatir Ji Dinyayê Dixwaze....172

**Dawiya Gotinê.... 175**

**Çavkanî.... 181**

**Indeks.... 187**

# Serê Gotinê

Mislimanê ku dizane ka Hz. Pêxember (s) ji bo wî hêjahiyeke çawa ye, ji bo hezkirina wî gelekî xîret dike û seba îdiaya hezkirina xwe îsbat bike jî hewl dide da ku karên wî rast didêrin pêk bîne. Ji bo mislimanekî wiha îdealê herî mezin ew e ku, pêxemberê xwe yê ku hê çavpêneketî jê hez kiriye, bûye aşiqê wî, bi hezkirina wî dilê wî dişewite rojekê wî bibîne û bi xwe bikaribe jê re bibêje: *"Ya Resulullah! Ez gelekî ji te hez dikim."*

Vêca qet em li ser difikirin ka gelo me ev hevoka ji Pêxemberê Me (s) bi xwe re bigota, yê bersiveke çawa bida me? Gelo yê çi bigota? Gelo wê li hember vê gotina me wê xwe nebihîstinê daniya, em ji ber vê gotinê poşman bikarana? Yan wê bigota *"Heke tu di hezkirina xwe de cidî yî, ka tiştên ku vê yekê îsbat dikin?"* û ji me tiştên din bixwesta? Yan gelo wê ew hevoka em hemû dixwazin bibihîzin ji me re bigota: *"Ez jî ji we hez dikim."*

Di vê mijarê de em dikarin gelek texmînan bikin. Lê ev hemû texmînên me wê bê kêr bin, ji wan qet yekê mereqa me ji

holê raneke; heta ji vê wêdetir dibe ku ev temxîn peyvên ne hedê me ne bi me bidine gotin. Lewra di qadeke Pêxemberê Me (s) xeber nedaye de xeberdan, li ser navê texmînkirinê; tê wê meneyê ku mirov li ser texmînên xwe hewl dide ku Hz. Pêxember bide xeberdan. Tiştekî wiha ne ew e ku mirov guhdariya wî dike, lê gotina xwe bi wî dide guhdarkirin. Ji ber vê hindê di hemû pirs û pirsgirêkên derdikevin pêşiya me de, tiştê serê ewil divê em bipirsin ev e; gelo di vê mijarê de beyaneke Pêxemberê Me heye ya na yan di vê qadê de mîrasekî derbasî jiyanê bûye û yan jî dijî li pey xwe hîştiye yan na.

Heke em li gor vê qaîde/rêgeza bingehîn hereket bikin, ji terekeya nebewî ya Pêxemberê Me (s) pirsa em dixwazin bersiva wê hildin bikin û bibêjin: “Heke em rojekê rastî Pêxemberê Me (s) bên û ji wî re hezkirina xwe beyan bikin, gelo wê bersiveke çawa bide me? Kerem bikin em bersiva vê bi hev re bixwînin:

Ji egîdên sehabiyan Ebdullah bîn Muxaffel[1] radigihîne dibêje: “Rojekê ji sehabiyan yek hate hizûra Pêxemberê Me (s) û bi dengekî bilind got: *“Ya Resulallah! Ez bi Xwedê sond dixwim ku ez gelekî ji te hez dikim.”* Pêxemberê Me (s) wiha li wî sehabiyî nihêrî û got: **“Tu haj pê heyî ka tu çi dibêjî?”** Sehabî mîna kesekî haj bi gotina xwe heye û gelekî xwe bawer gotina xwe

[1] Ebdullah bîn Muxaffelê ku bi kunyeya *Ebû Seîd* yan jî *Ebû Ziyad* tê nasîn xelkê Medîneyê ye. Tê gotin ku ayeta 92yan ya sûretê Tewbeyê di derheqê wî û sehabiyên din yên dişibine wî de nazil bûye. Wî ji zar û zimanê mibarek yê Pêxemberê Me (s) 43 hedîs rîwayet kirine. Hîcrî di sala 59/Mîladî 679an de li Basrayê wefat kiriye, li ser wesiyeta wî ji sehabiyan Ebû Berze el-Eslemî nimêja cinazeyê wî da kirin. Ji bo agahiyên hê bêtir yên derheqê wî de bnr: Îbn Hacer, *el-Îsabe,* c. 2, r. 1127, 1128; Îbn Esîr, *Usdul Xabe,* c. 3, r. 395, 396

dîsa dubare kir: *"Ya Resulallah! Ez bi Xwedê sond dixwim ku ez gelekî ji te hez dikim."*

Pêxemberê Me (s) jî dîsa heman peyva xwe got: **"Tu haj pê heyî ka tu çi dibêjî?"** Sehabî cara sisyan jî hevoka xwe dubare kir: *"Ya Resulallah! Ez bi Xwedê sond dixwim ku ez gelekî ji te hez dikim."* Çaxê Pêxemberê Me (s) biryardariya wî sehabiyî dît, wekî bide fêrkirin ka hezkirina heqîqî çawa ye wiha got: **"Heke tu ji min hez dikî, wê çaxê li hember feqîriyê amade û bizirx be. Lewra feqîrî ji lehiyeke ji jor ve tê zûtir xwe digihîne kesê ji min hez dike."**[2]

A bersiva Pêxemberê Me (s) ya ji bo kesekî jê re digot: *"Ez gelekî ji te hez dikim"* ev bû. Meriv dikare vê bersiva Pêxemberê Me (s) ji gelek hêlan ve binirxîne.[3] Heke em ji hêla mijara ku emê li ser rawestin ve li hedîsê binihêrin, tiştê em dikarin bibêjin ev e; li dinyaya Pêxemberê Me (s) hezkirin tiştekî wisa nîne ku zehf erzan were bidestxistin. Lê çi ye? Gava em li jiyana Pêxemberê Me (s) dinihêrin em demildest pê derdixin ka ev çima wisa ye.

Bidine hişê xwe, Qasidê Xwedê (s) dema bû mixatabê wehyê çil salî bû. Heya wê rojê li mala herî bedew ya li Mekkeyê û jê re digotin *Radîatul-Ke'be/Xweşîka Şîr Ya Ke'beyê* dijî.[4] Li Mekkeyê û li bazarên herêmê ticarekî gelekî başê pêbawer e. Her çendî sermayeya wî ya şexsî tunebe jî ji ber sermayeya maliya wî Xedîceyê hal û wextê wî pir xweş e. Kesekî wisa ye ku civak

[2] Tirmizî, *Zuhd,* 36

[3] Îmam Newewî, *Riyazus-Salihîn,* c. 3, r. 233, 234

[4] Mihemmed Ebduh Yemanî; *Ummul-Muminîn Xedîcetu Bîntu Xuweylîd Seyyîdetun fî Qelbî Mustafa,* r. 37

wî bi nasnavê *el-Emîn* dinase, qedrê wî digre, serî li hakemiya wî dixin û li cem her kesî yekî hezkirî ye.

Heyameke di rewşeke wiha de ye, mîladî di sala 610an de şeveke duşemê/Şeva Qedrê li şikefta Hîrayê ew û Cebraîl hevdu dibînin, dibe mixatabê pênc ayetên ewil yên kelamê îlahî, bi dehşeteke mezin vedigere mala xwe, xwe diavêje nav destê Hz. Xedîceyê (r) û êdî ji vê şûnda heyata wî ji binî ve hatibû guherîn. Kesên duh dostê wî bûn nişkêve jê re bibûn neyar; yên duh qîmet didane gotina wî, demildest ji bo dengê wî bibirin/kêm bikin çi ji destê wan dihat dikirin; yên duh pê re bazirganî dikirin ew hildabûn bin mihasereyê hemû têkiliyên xwe jê birîbûn.

Ka gelo nişkêve çi guherîbû li derûdora Pêxemberê Me (s) guherînên bi vî rengî bingehîn pêk hatibûn? Tiştê hatibû guherîn kifş bû. Ev zatê duh tenê *Mihemmedul-Emîn* bû, îro bibû *Mihemmed Resulullah,* ji bo îqameya heq seferber bibû. Îqameya heq îzaleya batil bû. Çaxê îzalekirina batil dest pê kiribû jî kesên heya wê rojê alîgirên batil bûn, aciz bibûn. Lewra hemû pêxemberên hatibûn şandin ne ku ji bo li dinyayê cenetê bi mirovahiyê bidin jiyandin hatibûn, lê ya rastî ewna hatibûn da ku mirovan bigihînin cenetê. Ji ber vê hindê pêxember ne ji bo "*rihetiyê bidin*" mirovan hatine, lê ji bo "*acizkirinê*" hatine şandin. Çaxê wiha be, wanê ji pêxemberan hez dikin, hewl didin ku di rêya wan de bimeşin, divê ji bo dayîna hinek berdêlan amade bibûna. A Pêxemberê Me (s) ji bo vê beyan bike gotibû: **"Heke tu ji min hez dikî, wê çaxê li hember feqîriyê amade û bizirx be. Lewra feqîrî ji lehiyeke ji jor ve tê zûtir xwe digihîne kesê ji min hez dike."**

Feqîriya ku di hedîsê de qala wê tê kirin, tenê feqîriya madî nîne, ligel vê sebra li hember bela û musîbetên ku çaxê emelên hezkirina wan îsbat dikin pêk tînin tên serê wan jî di nav wê de heye. Lewra gotina *"Ez ji te hez dikim"* îdiayek bû; çawa ku her îdia ji xwediyê xwe îsbatê dixwaze, vê îdiayê jî îsbat dixwest. Îdiayên nedihatine îsbatkirin, tenê dibûn gotinên bêbingeh, tu xêra wan tunene.

Di dê pirtûkê de ji bo hezkirinên me bêbingeh nemînin, em fêr bibin ka bi rastî *"Hz. Pêxember (s) çawa tê hezkirin?"*, emê hewl bidin ku ji qehremanên hezkirinê; nesla sehabiyan ango ji wan egîdên ehlê vî karî ne hezkirina pêxember hîn bibin.

Pirtûka me ligel beşa destpêkê, bi tevahî ji pênc beşan pêk tê. Emê bixebitin ku:

**Di Beşa Destpêkê de;** exlaqê hezkirinê,

**Di Beşa Pêşîn de;** divê em Pêxemberê Me (s) çima û çawa hez bikin,

**Di Beşa Duduyan de;** sehabiyan ji Pêxemberê Me (s) çawa hez kiriye,

**Di Beşa Sisyan de;** Pêxemberê Me (s) çawa ji sehabiyan hez kiriye,

**Di Beşa Çaran de;** Pêxemberê Me (s) ji umeta xwe çawa hez kiriye fêm bikin/qalê bikin.

Di pirtûka me de sernavên beşan biguherin jî, alî (yê hez dike û yên tên hezkirin) biguherin jî tiştê neguhere tenê; wê hezkirin be, li ser hezkirinê wê bê axaftin, ango emê hezkirinê hîn bibin.

Mijara ku em dixwazin wek bingeh li ser rawestin; bi mînakan bibînin/nîşan bidin ka sehabiyên ku qehremanê hezkirinê ne, ji Pêxemberê Me (s) çawa hez kirine, ji dinyaya wan nimûneyan veguhêzînin dinyaya xwe. Ew nifşa bijareya ku di rêya hezkirina xwe de fedekariyên gelekî mezin kirine, bi jiyana xwe nîşanî hemû muminên ji pey wan re hatine dane ku ev şixula erzan û sivik nîne. Ya li me dikeve jî ew e ku em hewl bidin da ku wan rast fêm bikin û qala wan bikin. Her wiha em vê rastiyê tenê nekine mehkûmê gotinên bixemlê li civînên hestyarî serdest e tên gotin, lê ji jiyana wan nimûneyan derxin û derfeteke wisa pêk bînin ku ev rastiya li dinya me ya îro jî were jiyîn.

Çaxê em we rêwî dikin ku hûn berê xwe bidine wê îqlima sehabiyan ya ku merivan zindî dike seba ku hûn hezkirinê hîn bibin, em jî ji Rebbê xwe niyaz dikin ku bike nesîbê me da ku em jî bikaribin Pêxemberê Me (s) di hesbîtiya sehabiyan de hez bikin.

Ev xebata me ya ji kêmasiyan dûr nîne, heke di warê rasthezkirina Pêxemberê Me (s) de tevkariyeke piçûk jî bike, ev ji bo me qezenca herî mezin e.

*Xebat û xîret ji me, encam û xelat ji Rebbê me ye.*

**Muhammed Emîn Yildirim**
27 Safer 1432/2 Sibat 2011
Eyûb/Stenbol

# Destpêk

Divê jiyana mislimanekî li ser exlaq bê avakirin. Lewra di avahiya dîn de exlaq qatê piştî îmanê ye, ji bo jiyana mirovê ku sedema hebûna wî ebdîtiya Xwedê ye jî tixûb û prensîbên herî bingehîn in. Ji ber vê yekê ye ku Pêxemberê Me (s) yê di dînê me û jiyana me de muelimê me yê herî mezin e, çaxê xayeya şandina xwe radigihîne alemê wiha dibêje: **"Ez ji bo temamkirina eqlaxê xweş hatime şandin."**[5] Ya rastî bi taybetî jî jiyana Pêxemberê Me (s) ya rîsaletê ya 23 salî û her wiha jiyana wî ya çil salî ya beriya rîsaletê, ango her wêneyê jiyana wî ya 63 salî, jiyaneke wisa ye ku eqlaxê herî hêja jê hatiye telîmkirin. Hûn kîjan rûpelê jiyana bibereket ya Pêxemberê Me (s) vedikin vekin, ya ku wê derkeve pêşberî we ev e. Di şer de exlaq, di aştiyê de exlaq, li malê exlaq, li kar exlaq, li mizgeftê exlaq, li bazarê exlaq, heke hûn dijmirin bijmirin, ne mimkun e hûn ji xêncî vê rastî encameke din bên. Jixwe Qur'anê beyan kiriye ku ew xwediyê exlaqekî muhteşem e,[6] dayika me Eîşe

[5] Îmam Malik, *Husnul-Xuluq,* 8; Eclunî, *Keşful-Xafa,* c. 1, r. 211
[6] Sûretê Qelem, 68/4

(r) ya ku Pêxemberê Me (s) ji her kesî rindtir nas dike, li ser pirsekê dibêje; "Exlaqê wî Qur'an bû."[7] Bi vî awayî rastiyeke bingehîn beyan kiribû ku exlaqê wî şeklê Qur'anê ye ketiye nav jiyanê.

Gelo em wiha bi nezera exlaq li jiyana Pêxemberê Me (s) ya 63 salî ya bibereket binihêrin emê rastî tabloyeke bi çi rengî bên? Çaxê em rûpelên siyerê bi vî çavî biqulibînin peyama ku emê hildin ev e:

- **Mala Amîneyê:** Exlaqê hezkirin û hurmeta ji dayikê re
- **Mala Helîmeyê:** Exlaqê ligel merivên cuda jiyanê
- **Mala Ebdulmuttalib:** Exlaqê têkiliya bi mezin û lêziman re
- **Mala Ebû Talib:** Exlaqê bêyî meriv xwe bispêre hin kesan li piya mayînê
- **Şerên Fîcarê:** Exlaqê Parastinê
- **Xilful-Fudûl:** Exlaqê li hember zaliman, piştgiriya mezlûman
- **Ziyaretên Busra û Şamê:** Exlaqê bazirganî û kar
- **Zewaca bi Hz. Xedîceyê re:** Exlaqê malbat, mêrtî û bavtiyê
- **Hakemiya li Ke'beyê:** Exlaqê hikûmdayînê û helwesta li hember pirsgirêkan
- **Hîra**: Jana hebûnê û exlaqê lêgerînê
- **Darul-Erqam:** Exlaqê perwerde û hîndekariyê

[7] Muslim, *Musafîrîn,* 139; Ebû Dawud, *Tatawwu,* 26

- **Şîbî Ebî Talib:** Exlaqê desttengî û feqîriyê
- **Taîf:** Exlaqê dawet û teblîxê
- **Aqabe:** Exlaqê bîet û dilsoziyê
- **Sewr:** Exlaqê tedbîr û tewekûlê
- **Hîcret:** Exlaqê rê û rêwîtiyê
- **Medîne:** Exlaqê dewlet û îqtidarê
- **Muexet:** Exlaqê biratî û parvekirinê
- **Qible:** Exlaqê cih û alî
- **Mekteba Suffayê:** Exlaqê ilim û îxtisasê
- **Bedir:** Exlaqê biserketin û xalibiyetê
- **Uhud:** Exlaqê têkçûn û mexlûbiyetê
- **Benû Qaynuqa:** Hurmeta ji miqaddesatan re û exlaqê parastina wan
- **Benû Nadir:** Exlaqê mumin ya li hember bêbextî û bêdilsoziyê
- **Bûyera Îfkê:** Exlaqê misliman ya li hember îftira û xeberên bêbingeh
- **Xendeq:** Exlaqê sebr û berxwedanê
- **Benû Qureyza:** Exlaqê desthilatiyê ya li hember mixalefetê
- **Hudeybiye:** Exlaqê sedeqata aştî û peymanê
- **Umreya Qezayê:** Exlaqê nefspiçûkî û îzzetê
- **Xeyber:** Exlaqê şer û têkoşînê

- **Mûte:** Exlaqê îtaet û teslîmiyeta ji rayedaran re
- **Fetha Mekkeyê:** Exlaqê feth û quwetê
- **Huneyn:** Exlaqê hêz û hejmarê
- **Ewtas û Taîf:** Exlaqê mal û xenîmetê
- **Tebûk:** Exlaqê înfaq û tengasiyê
- **Hecê Wedayê:** Exlaqê hec û xemgîniyê
- **Wefat:** Exlaqê mirin û jihevqetînê

Em kîjan rûpela Siyera Mistafa (s) vekin jî encama ku wê derkeve pêşberî me ji bilî vê tiştekî din nîne. Ev heqîqet tenê bi jiyana Pêxemberê Me (s) jî sînorkirî nîne. Heke em ji hêla sehabiyan ve jî li meseleyê binihêrin, dîsa emê heman peyamê bibînin. Eshabê Kîram şexsiyetên nadîde û bijare ne ku bi destê Pêxemberê Me (s) Nebiyê Pîrozê ji bo temamkirina exlaqê rind hatibû şandin hatine perwerdekirin. Pêxemberê Me (s) çaxê ev koma egîdan li ber destê xwe perwerde dikir, ji wan her yek di qadeke cuda ya exlaq de wekî kesayetiyeke abîdewî perwerde kiriye, heke gotin rast be ewna di wê potaya nebewî ya ku wî bi xwe çêkiriye de bi şûrê almast yê Qur'anê ve kemilandiye û derxistiye asteke kifş ya kemalê.

Li vir mijareke din jî heye ku divê meriv balê bikşîne ser: Pêxemberê Me (s) yê ku exlaqê hemîdiye/exlaqê rindê pesnê wê hatiye dayîn di jiyana xwe de kom kiriye, ji hêlekê va her xesleteke vî exlaqê rind di sehabiyekî de derdixist asta herî bilind; bi awayekî pratîk jî bi xwe nîşanî me daye ku halê herî îdeal yê vê xesletê çi ye. Gava rewş ev be em li ber deftera kîjan sehabiyê Pêxemberê Me (s) bibine mêvan, em bixwazin kîjan sehabiyê Pêxemberê Me (s) fêm bikin, herdem divê di hişê me de meraqa

*“Gelo ji Pêxemberê Me (s) kîjan rêç li para vî sehabiyî ketiye?”* hebe û em wisa dest bi rêwîtiyê bikin. Lewra Pêxemberê Me (s) rêçên wisa mayînde li ser alema hebûnê hîştine ku dîrokê di wê astê de nimûneyeke duduyan ya mîna wê nenivîsiye. Nîşana herî mezin ya van rêçan jî ew nifşa pîroz e ku wî bi destê xwe perwerde kiriye. Ji ber ku rewş wiha ye, li ser her sehabiyekî, em dikarin rêça wê firçeya bedewa ku Pêxemberê Me (s) boxaya îlahî ya di destê xwe de têdaye bibînin.

Heke em bixwazin ji hêla exlaqî ve mêze bikin, gelo emê li ser desteyeke ji sehabiyan tabloyeke çi tehrî bibînin? Em dikarin bersiva vê pirse wiha bidin:

- **Hz. Ebû Bekir:** Exlaqê sidq/rastî û sedeqatê
- **Hz. Omer:** Exlaqê quwet, hêz û edaletê
- **Hz. Osman:** Exlaqê heya, edeb û înfaqê
- **Hz. Elî:** Exlaqê ilm, wêrekî û têkoşînê
- **Hz. Xedîce:** Exlaqê fedakarî, wefa û dayiktiyê
- **Hz. Zubeyr bîn Ewwam:** Exlaqê îxlas û dostiyê
- **Talha bîn Ubeydullah:** Exlaqê kerem û comerdiyê
- **Ebû Ubeyde bîn Cerrah:** Exlaqê emanet û emniyetê
- **Ebdurrehman bîn Ebî Weqqas:** Exlaqê hemiyet û hemasetê
- **Seîd bîn Zeyd:** Exlaqê teslîmiyet û dilsoziyê
- **Eîşe bînt Ebî Bekir:** Exlaqê ilim û îctihadê
- **Mus’eb bîn Umeyr:** Exlaqê evîn û eşqê

- **Erqam bîn Ebîl-Erqam:** Exlaqê telîm û terbiye/perwerde û hîndekariyê
- **Ebûzerê Xifarî:** Exlaqê nefspiçûkî, îzzet û zuhdê
- **Esma Bînt Yezîd:** Exlaqê weqar û îtidalê
- **Nesîbe bîn Ke'b:** Exlaqê sebr û îffetê
- **Sumeyra bîn Ubeyd:** Exlaqê dayiktî û gorîkirinê
- **Enes bîn Nadir:** Exlaqê cîhad û fedakariyê
- **Ebdullah bîn Cahş:** Exlaqê teqwa û şehadetê
- **Ummu Eymen bînt Salebe:** Exlaqê rehmet û merhemetê
- **Hebbab bîn Eret:** Exlaqê nefspiçûkî û berxwedanê
- **Ebdullah bîn Mesûd:** Exlaqê hikûmdayîn û helwesta li hember meseleyan
- **Emmar bîn Yasîr:** Exlaqê sebat û îttibaya bi heq
- **Bîlalê Hebeşî:** Exlaqê hezkirin û tewekulê
- **Selmanê Farisî:** Exlaqê pêbawerî û li heqîqetê gerînê

Ger ku em li wan rêçên kûrê Pêxemberê Me (s) û sehabiyên li ber destê wî yê mibarek mezin bûne bi nezera exlaq binihêrin, encameke girîng ya bi vî rengî bi dest dixin. Di vê babetê de em pirseke wiha dipirsin: Gelo Pêxemberê Me (s) yê ku *Usweî Hesene* ye, di hemû kêlî û qadên jiyanê de rêberê me yê bênîqaş e, wekî ku ji Qur'anê îlham hildaye hemû qadên exlaq yên lazimî me ne hînî me kiriye, ***exlaqê hezkirinê*** jî hîn dike? Bersiva ku wê ji bo vê pirsê bê dayîn helbet wê bibe 'erê'. Çawa ku alem gelek tiştan ji wî hîn bû, evîn, hezkirin, ji teref kesên din ve hezkirin, hezkirîbûn û exlaqê van hemûyan ji wî hîn bû.

Pêxemberê Me (s) bi jiyan, gotin û telebeyên perwerde kirine ve pir bi hûrgilî û têkûz hînî me kir ku rêgezên gelekî bingehîn yên hezkirinê hene, ev rêgezana li gor nasnameya aliyan (yê hez dike û tê hezkirin) diguhere.

Em ji mînaka hezkirin û mihebeta wî ya ji dostên li derûdora wî gelek tiştan hîn bûn ka divê hezkirina di navbera dost û hevalan de çawa be.

Em ji wî gelek tiştan hîn bûn ka divê hezkirina ewlad-dêû-bavê, ya ewlad ji bo dayik û bavê wî, ya dayikê ji bo zaroka wî, ya bavê ji bo zaroka wî çawa be. Bo nimûne; heke Pêxemberê Me (s) hînî me nekiriba sê bav ancax qasî dayikekê dikin[8] me yê ji ku re bizanibûya qedrê dayikê ewqasî bilind e?

Em ji wî gelek tiştan hîn bûn ka divê hezkirina di navbera xwendekar-mamoste, seyda-telebe, karker-karsaz, hevkarên ticarî û hê gelek aliyan de bi çi awayî be.

Ne tenê aliyê hezkirinê yê însanî di heman demê de em aliyê hezkirinê yê îlahî jî ji wî hîn bûn, bo mînak; ma qey Pêxemberê Me (s) fêrî me nekir ka di meneya heqîqî de Xwedê (c) çawa tê hezkirin? Heke wî hînî me nekira ka divê di meneya heqîqî de hezkirina Xwedê çawa be, ango heke rêgezên exlaqê hezkirina di navbera Xwedê-mirov de nîşanî me nedana, emê di vê mijarê de çiqasî neçar bibûna ne wisa? Lê em îro, bi saya

[8] Ji eshabiyan yekî ji Pêxemberê Me (s) pirseke wiha pirsî: *"Ya Resulullah! Kesê ku divê ez herî zêde jê re miemeleyeke baş bikim û herî zêde jê re xizmetê bikim kê ye?"* Pêxemberê Me (s) got: **"Dayika te ye."** Sehabî got: *"Paşê kê ye?"* Pêxemberê Me (s) dîsa got: **"Dayika te ye."** Sehabî dîsa pirsa xwe dubare kir got: *"Paşê kê ye?"* Pêxemberê Me (s) cara sisiyan jî got: **"Dayika te ye."** Gava sehabî careke din dîsa pirsî: *"Paşê kê ye?"* Pêxemberê Me (s) got: *"Bavê te ye."* Buxarî, *Edeb,* 2; Muslim, *Bîrr,* 1, 2; Ebû Dawud, *Edeb,* 120

tesewira Xwedê ya di dinyaya Pêxemberê Me (s) de û li gor rêgezên exlaqê hezkirinê yên ku ji vê tesewira rast pêk hatine, em xwedî wê derfetê ne ku bikarin di warê hezkirina Rebbê xwe de pergaleke durist ava bikin.

Vêca Pêxemberê Me (s) yê ku di her qada hezkirinê de rêgezên exlaqî hînî me kirine, gelo hînî me kiriye ka divê em çima û çawa ji wî hez bikin? Helbet hîn kir. Em di meneya heqîqî de ji wî hezkirinê jî tenê dikarin dîsa ji wî hin bibin. Çaxê em serî li mîrasê wî yê nebewî dixin, him di Qur'anê de him jî di suneta ku beyan/şîrovaya Qur'anê ye de em peyamên gelekî girîng dibînin ka divê çima Pêxemberê Me (s) were hezkirin û helbet divê bi çi awayî were hezkirin. Naxwe kerem bikin; pêşiyê em ji pirsa 'çima"yê re paşê jî pirsa 'çawa'yê re bersivê bibînin.